

**Hizentra®**  
Humant normalî immunoglobulîn (SClg) 20% l sning

Dermankirina niv şkaniya  miniy  bi  
 m noglobul na (immunoglobulin) bin erm 

L zan n n t kildar  nexwe an   xizm n wan



Dermankirina rêkûpêk bi Îmunoglobulînê  
(immunoglobulin) ji bo te an jî zarokên te hatiye  
destûrdayîn.

Li tu yê şiroveyeke kurt ji pergala ewlehiyê ya leşî  
bibî, nakokiyên nivîşkaniya ewlehiyê û Hizentra,  
îmûnoglobûlîna ku bijîşkê te ji bo dermankirina te  
an zarokê te bijartiyê, lêzanînên pirtir werbigirî.

# Pergala elwehiyê

Pergala ewlehiyê ji çend hêmayên cûr bi cûr pêk hatiye ku pêkanîna erkên xwe li kêleka hev, bedena te ji hokarên ufûneta derveyî ji wan bakterî û vîrûsa diparêze. Pergala ewlehiyê (zîkmakî) ya ne-taybetî ku wek mînak ji çerm û perdeyên liçikî pêk tê, yekem bereya berevaniyê li hemberî hokarên derveyî pêk tîne. Pergala ewlehiyê ya taybetî wek mînak pêkhatî ji hucreyên sipî yên xwînê, ji wan lîmfosîtên (lymphocyte) B û T ye.

## Lîmfosîtên B û Dijeleş (antîbodî)

Lîmfosîtên B hin antîbodiyan çêdikin ku ji bo berevaniya ji pergala ewlehiya leşî, bi taybet li hemberî înfeksiyonên ji ber bakteriyê alîkar in. Her antîbodiyeke bi hokareke taybet a kêmgirtinê va tê girêdan ku ji bo naskirina wê hatiye terxankirin. Dema ku ev girêdan pêk tê, Lîmfosîtên B dizanin ku kîjan hokara nexweşîçêker ji nav bibin.

## Lîmfosîtên T

Lîmfosîtên T li şerê dijî vîrûsan roleke gelekî girîng hene. Ewna dikarin Lîmfosîtên B jî çalak bikin û alîkariya wan bikin ku Antîbodiyan çêbikin.

## Çend cûreyên dijeleşan hene, ji wan:

**IgA** – pirranî li perdeyên liçikî yên lêş hene û rê li ber bandora zêde ya hokarên nexweşiyê li ser bedenê digirin.

**IgG** – li nav xwînê digerin û li nav tevînekan (Çerm û damar û hwd) jî hene. IgG li ser çar komên jêrê tê parçekirin: IgG1, IgG2, IgG3 and IgG4.

**IgM** – li nav xwînê digerin û li nav tevînekên leşî jî tên dîtin. Antî Bodiyeên IgG yekemîn Antî Bodî ne ku di dema tûşbûna te bi nexweşiyê tên naskirin.

### Facts box

Immunoglobulin = Gammaglobulin = Antîbodî

# Kêmasiya dijeleşê

## **Nakokiya Antî Bodî ya seretayî**

Kêmasiya Antîbodî ya seretayî ji ber nivîşkaniya pergala ewlehiyê pêk tê ku şiyana Lîmfosîtên B ji bo berhemanîna qasa têrê ya Antîbodiyan dêxe bin bandora ku di encamam wê da mêkanîsma berevaniyê li hemberî hokarên nexweşîçêker lawaz dibe.

## **Kêmasiya dijeleşa seretayî ya herî nasyar**

**Kêmasiya IgA an IgG:** Ev rewş di demekê da diqewime ku IgA an IgG'ya giştî ya te gelekî kêmbê. Derbarê kêmasiya IgA'yê, dibe ku we an çend babet ji binkomên jêrê yên IgG'yê li te hebin.

**Nivîşkaniya ewlehiya Guhêrbar (CVID):** Li nivîşkaniya ewlehiyê ya guhêrbar, CVID (Nivîşkaniya ewlehiya guhêrbar a naskirî), bi giştî Antîbodiyan IgG û IgA'yê gelekî kêmbê hene û li hin babetan Antîbodiyan IgM'yê kêmbê in.

## **Agamaglobulînemiya (agammaglobulinaemia) (XLA) têkildarî X:**

Agamaglobulinaemia (XLA) ya girêdayî bi X, cûreyeke nexweşiyê ye ku tenê bandorê li pergala ewlehiyê ya kesên nêrza dike û ji ber aloziya jenetîkî ya kromozoma X pêk tê. Ev nivîşkanî dibe sebeba kêmbûna giran a şiyana ji bo berhemanîna **gişt cûreyên**.

## **Nivîşkaniya Antî Bodî ya duyem**

Kêmasiya Antîbodî ya duyemîn ji ber nexweşî an dermana bijîşkî pêk tê û hegera wê nivîşkaniya li pergala ewlehiyê nîne.

# Hizentra®

Hizentra Antîbodiya IgG ya zelalbûyî (Ne-Tîr) ye û ji plasmaya xwînê ji hejmareke zêde ya xelatkerên xwîna saxlem tê derxistin. Raberkerên xwînê dikevin bin çêkapeke bijîşkî ya gellek tam û kamil û ji bo her cûreya hokara nexweşîçêker ji wan Vîrûsa HIV'yê û vîrûsa Hêpatîtê tèn ceribandin. Û di heyama berhevanînê Plasma dikeve bin rêzeqonaxên paqijkirina cûr bi cûr ku her cûre hokarên nexweşîza ji bêtevger dike.




Hizentra dikare di tevahiya heyama mayîna xwe di germahiya odeyê da (heta 25°C) da were ragirtin. Hizentra li besteyên 10\*10 mîlîlîtrî jî heye.

# Hizentra dewsa dijeleşa jidestçûyî digire

Dermana kêmbûna Antî Bodiyan hewcedara tezrîqa (têrekirina dermanê) a birêkûpêk a Hizentra`yê ye ku bi giştî carekê li hefteyê pêk tê da ku bi vî awayî bibe dewsgira Antî Bodiye ne-heyî ku Lîmfosîtên B li pergala ewlehiyê nikarin berhem bînin. Armanca vê dermanê kêmkirina hejmara nexweşyan e.

Hizentra ku bi rengê şilaveke mehlûl e ku tê derzîlêdan, bo bin çêrm, bin çermê ser zik, hêt û / an çîpan tê derzîlêdan (Bin çermî). Ev dermana binçermî sade û ewleh e û bi giştî piştî wergirtina destûr û hîndekariyên pêwîst ji perestar û doxtor li dermangeha pispor a hûn dikarin bi xwe li malê wê tezrîq bikin.

## Immunoglobulin di vê beşê da tê derzîlêdan



# Şêwaza derzîlêdana Hizentra'yê

## Fermanên gav bi gav


Dermangehên pispor û taybet li Swêdê dibe ku şêwazên din ji bo dermanê her wiha cûreyên din ên alavên alîkar ji bo derzîlêdanê ji wan Pomp, Kanolaya Hilmijînê, Sireng, Derziyên derzîlêdanê û hwd hebin. Ev defterçe çend cûreyên alavên alîkar ên bijîşkiya derzîlêdanê nîşan dide. Eger doxtorê/a te alaveke din a tezrîqê destûr daye, destûrkara raberkirî ji aliyê dermangeha xwe bi kar bîne.

Ji bo zarokên ku hewcedara krîma bêhestkirinê ya zeliqokê ne, bila serî li destûrkara raberkirî ji aliyê dermangeha xwe va bidin.

1. Destên xwe bi av û sabûnê bişû.



2. Tîrbûneke durist ji Hizentra'yê û şilava derzîlêdana ku ji bo te hatiye destûrdayîn, berhev bîne.







3. Vekolîne ku tarîxa jikarketinê (expiry date) ya nivîsandî li ser Viyalan derbas nebûne, viyal (vial) saxlem bin û mehlûla hundirê wan zelal be. Derpûşa polompa botriya dermanê rake; Layeya lastîkî ya ser botriyê li çiyê xwe bihêle.




4. Derzîlêdanê amade bike. Cildê muhafiz a Kanolaya hilmijînê rake û botriya biçûk a dermanê li ser asteke saf û text dayne. Serê derziyê (cannula) ji nav perdika plastîk a viyalê bike û dapûşê veke.




5. Derziyê li Kanolaya Hilmijînê girêbide.




6. Botriya dermanê û Kanolaya hilmijînê berovajî bike. Piştrast be ku serê kanûlayê (cannula) hertim bi mehlûlê hatiye nixûmandin. Eger li nav botriya dermanê zîpik çêbûne, çend çirkeyan rawest da ku zîpik ji nav herin. Hilmijînera lastîkî bi baldarî û bi dehf bide ber bi jêr da û sorengê tijî bike. Dema ku sireng (syringe) hat tijîkirin, kanûlayê veqetîne.




7. Bi têhildana (dehfdana) aram a hilmijînera lastîkî hewayê ji sîrengê derxîne da ku hewa bi giştî ji sîrengê (ampolê) bê derxistin. Zîpikên biçûk ên hewa xeternak nînin.




8. Tiyûba derziya derzîlêdanê li sîrengê girêbide. Bi baldarî deh f bide da ku immunoglobulin tiyûbê tijî bike.




9. Li gorî destûrkara raberkirî bo te, derziyê (derziyan) di çermê paqij ê zik, ran û / an jî çîpên xwe re bike. Divê herî kêr 5 cm navbera mehlûlên derzîlêdanê navbir hebe. Derziyê (derziyan) neke cihên hasas, reşûşîn, sor an hişk. Derziyê li cihên ku birîn in an herîşînek li ser çerm çêbûye nexe.



10. Bi rîya bikaranîna bandaja bijîşkî derziyê li cîyê derzîlêdana dermên bêliv ragire.




- !** **11a.** Ev xal girîng e ku serê derziyê nekeve nav tamara xwînê. Eger viha bibe dûhatên biêş û giran wê tûşî te bên. **Hilmijînera lastîkî ber bi nav sorengê bi paşda bikişîne da ku dilniya bî ku serê derziyê li nav tamara xwînê nîne.** Eger ji ciyê têrekirna dermanê xwîn têkeve nav boriyê, wê çaxê divê bi riya bikaranîna derziyeke teze ya têrekirinê, û bijartina nuxteyeke teze ya têrekirina dermanê ji nû va dest pê bikî. Eger amûreke derzilêdanê tê bikaranîn ku çend derziyên wê hene, boriya bikarhatî divê bi girêkekê were girêdan.



- !** **11b.** Bi qasî 15 çirkeyan boriyê ji derziyê derxîne û lê binêre ku xwîn xuya nebe. Baldar be ku tu divê seh bikî ku xwîn li tiyûba plastîkî nêzikî derziyê nebe, ne ku Tiyûb nêzikî Sirengê. Eger tu xwînek li Tiyûba lastîkî xûya nebe, dikarî bidomînî.



- 12.** Sirengê li pompeya ku ji bo te hatiye destûrdayîn girêbide û dermankirinê dest pê bike.



13. Dema ku derzîlêdana dermên pêk hat, derziyê (derziyan) derxîne û tenzîb an zeliqoekê li ser ciyê derzîlêdana dermên xîne. Hemî alavên bikarhatî li gorî destûrkara raberkirî bo te ji aliyê perestar va bi awayekî ewleh dûr bavêje. Hizentra'yê tu madeyeke parastinê tune, loma girîng e ku bin tu awayî mehlûlên mayî li viyalan dîsan bi kar neyînî. Ji bîr neke ku hejmara çêkirina viyalan û tarîx û dema derzîlêdanê belgewartomar bikî.



Baştir ev e ku carinan bi xwendina van destûrkaran, bîra xwe bi roj bikî.

## Rêvebirin bi bikaranîna Guvaşa destî – qaşo "Guvaşa Bilez"


Bi bikaranîna Guvaşa destî – qaşo "Şêwaza Guvaşa Bilez" – tu dikarî leza derzîlêdanê dewsa ku bi bikaranîna pompeyê kontrol bikî, bi xwe kontrol bikî.

Tu divê heman şêwaza derzîldêanê ya di rûpela 7an da pêk bînî û destûrkarên rêdara derzîlêdanê, qonaxên 1-11 û 13 bişopinî. Tevî vê yekê, tu dikarî dev ji qonaxa 12an berdî û bi vî awayî derzîlêdana xwe derdem piştî qonaxa 11an dest pê bikî.

Derzîlêdanê li gorî destûrkara rêxistina xwe pêk bîne. Jibilî vêya, ew alîkariya te dikin ku derziyeke guncav ji bo xwe û her wiha hejmara cihên derzîlêdanê û hejmara carên dermanê xwe hilbijêrî.

Bikaranîna tenê cihêkî derzîldêanê ji bo her sirengekê girîng e. Di rewşa hewcetiya bi bikaranîna sirengeke (syringe) din, derziyeke strîl a nû bi kar bîne û cihê derzîlêdanê biguherîne.

Eger dixwazî zanyariyên zêdetir derbarê Guvaşa Bilez bi dest bixî, di gel perestarê xwe biaxive.



# Dûhatên pêreyî, hişyar û babetên baldariyê

## Dûhatên pêreyî

Dûhatên pêreyî gelekî kêr in; Lê bertekên deverî li ser çermî li niqteya derzîlêdana dermên bi giştî di destpêka dermankirinê da tîn dîtin. Nasyartirîn dûhat werimîn, hestiyarî û êş, sorbûn û xurîna çerm in. Ev bertekên nuxteyî bixeter nînin û bi hêdîka kêr dibin.

Ta (germaya leşî), Êşa serî, westiyar, Mîgren û bertekên alerjîk jî diqewimin. Eger dema têrekirina dermanê an bilez piştî têrekirinê tûşî yek ji dûhat û hestiyariyên giran bûyî, divê li gorî fermanên raberbûyî ji aliyê perestar va, bilez digel navenda xizmetên baldariya tendurustiyê pewayendiyê bigirî.

## Hişyarî û kiryarên baldariyê

Hizentra divê bi awayê binçermî têkeve nav dona bin çermî û nema divê ew bo nav tamarê bê têrekirin; Ji ber ku dikare tamaran bêxe bin bandora xwe û tevgera dil tûşî guhertinan bîne; Wek mînak fişara xwînê kêr bike.

Tecrubeyên bijîşkî bi immunoglobulins'ê nîşan daye ku bikaranîna vî dermanî tu bandoreke nerênî li ser cenîn an zarokê nû jidayîkbûyî nake, elbete eger tu ducanî û pêgirana an zarokê te ji şîrê te vedixwe, ji bo bikaranîna Hizentra'yê digel bijîşkê xwe bişêwre.

Ji bo wergirtina zanyariyên zêdetir, serî li defterçeya nav pakêta an serî li malpera [Fass.se](http://Fass.se) bide.



Tu dikarî li vir zanyariyên zêdetir li ser pergala ewlehiyê û nivîşkaniyên ewlehiyê peyda bikî

### **PIO; Saziya piştgiriya nexweşan ji bo nivîşkaniya ewlehiyê ya seretayî**

PIO rêxstitineke swêdî ji bo kesên tûşbûyî bi Nivîşkaniya ewlehiyê ya seretayî û malbatên wan e. [www.pio.nu](http://www.pio.nu)

### **Malpera Lijneya Neteweyî ya Tenduristî û Rehetiya Nexweşiyên Kêmdîtî**

[www.socialstyrelsen.se/ovanligadiagnoser](http://www.socialstyrelsen.se/ovanligadiagnoser)

### **Rêxistina Navneteweyî ya Nexweşan ji bo Nivîşkaniya Ewlehiyê ya Seretayî (IPOPI)**

Lijneya Navneteweyî ya piştgiriya ji Saziyên Neteweyî yên Cehanî

### **Binyata Cêfrî Modêl (Jeffrey Modell Foundation)**

Enstîtûyek ji bo raberkirina zanyariyan li ser nivîşkaniya ewlehiyê ya seretayî.

[www.jmfworld.com](http://www.jmfworld.com)

### **Ev defterçe bi awayê pêşeyî ji aliyê vî kesî va hatiye venihêrandin:**

**Loîz Alêksandêrson (Louise Alexandersson)**, Klînîka zarok û nûciwanan, Nexweşxaneya Hallandê, Halmstad

**Lîlêmor Canson (Lillemor Jansson)**, Klînîka mejî û esebê, Nexweşxaneya Zanîngeha Upsala'yê (Uppsala University Hospital), Uppsala

**Kirîstîna Yohansên (Kristina Johansson)**, Yekîneya nivîşkaniya ewlehiyê, nexweşxaneya zanîngeha Karolînskayê (Karolinska University Hospital), Huddinge, Stockholm

**Karîna Hagsted (Carina Hagstedt)**, Klînîka nexweşiyên înfeksiyonî, Nexweşxaneya Ryhov County'yê, Jönköping

**Katrîna Sodêrholm (Katarina Söderholm)**, Klînîka Mejî û Esebê, Nexweşxaneya Zanîngeha Skoneyê (Skåne University Hospital), Lund

**Madlîn Canson (Madeleine Johnsson)**, Lêmiqatebûna rojane ya Mejî û esebê, Nexweşxaneya Zanîngeha Salgrînskayê (Sahlgrenska University Hospital), Gothenburg

**Sûzan Hansên (Susanne Hansen)**, Yekîneya nivîşkaniya elwehiyê, Nexweşxaneya Zanîngeha Karolînskayê, Huddinge, Stockholm

**Marîna Lîndên (Maria Lindén)**, Yekîneya nivîşkaniya elwehiyê, Nexweşxaneya Zanîngeha Karolînskayê, Huddinge, Stockholm

**Canêt Nîstrom (Jeanette Nyström)**, Klînîka zarokan, Nexweşxaneya Zarokan a Kûyîn Sîlviya (Queen Silvia's Children's Hospital), Nexweşxaneya Zanîngeha Salgrînskayê, Gothenburg

**Anca Mos (Anja Moss)**, Beşa Onkolojiyê (Oncology), Nexweşxaneya Sundsvall-Harnösand Kantiyê (Sundsvall-Härnösand County Hospital)

**Hizentra®** Mehlûla 200 mg/ml Mehlûl ji bo derzîledana dermên bin çerm. Îmîyonoglobîna normal însanî (SClg = Îmîyonoglobîna biçermî). Hizentra berhemeke dermanî ye ku ji bo jordabirina asta kêma a îmîyonoglobîlîne li nav xwîna nexweşan bo asta asayî (dermanê dewsgir) û parastina hevsgengiyê di pergala ewlehiyê ya leşî (ku jê ra Pergala Ewlehiyê tê gotin) tê bikaranîn. Di van rewşan da derziya Hizentra'yê lînedu: Eger hestiyariya te li îmîyonoglobîlîna însanî, Poly Sorbata 80 an jî L-proline'ê heye; Eger tu tûşî nakokiya hyperprolinaemîa'yê yî (Cûreyek nakokiya jênetîkî ku mirov tûşî tîrtiya zêde ya asîd amîneya Prolîne (amino acid proline) li xwînê tîne). Wê li nav demarên xwînê lînexu. Berî bikaranîna Hizentra'yê digel doxtor an kedkarên baldariyên dermanî rawêjkariyê bike. Belgeya zanyariyên nexweş bi baldarî bixwîne. CSL Behring AB, Telefon.: +46 8 544 966 70. Ev zanyarî li ser esasa defterçeya zanyariyan li pakête ye 11/2021.

SWE-HIZ-0027, Çîleya (January) 2022an

**CSL Behring**  
Biotherapies for Life™

CSL Behring AB  
Box 712  
SE-182 17 Danderyd  
Telefon.: +46 8 544 966 70  
Faks: +46 8 622 68 38  
Email: [info@cslbehring.se](mailto:info@cslbehring.se)  
[www.cslbehring.se](http://www.cslbehring.se)